NEWROZ

Dr Nûredîn Zaza
1919 - 1988

Osman Sebrî
1905 - 1993

Xebat ji bo : * Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe.
* Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan.
* Mafên gelê Kurd yên netewî di çarçewa yekîtiya wel[êt de .

Ji *weşanên Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê - YEKÎTÎ*
Email : Newroz95@hotmail.com

Hejmar (84) Sibat 2009 z-2620 k Buha (15) ps

21ê Sibatê
"Roja Cîhanî Ya Zimanê Zikmakî"

Li gora belge û serhijmarên **rêxistina Çand, Zanist û Perwerdeyê a Netewên Yekbûyî(UNESCO)**, bêtirî 6000 ziman li ser rûçkê zemînê dijîn, lê mixabin, ku ji ber sedem û egerên cuda, nîvê van zimanan ber bi pişaftin û windabûnê ve diçin.

Bê goman e, ku her zimanek, zanist, çand, huner û dîroka miletekî nîşan dide. Bi xebat û kêferata hizerên salan ew sax ma ye. Her zimanek, kîjan dibe bila bibe, ji bo çand, tore û hunera navnetewî semyan û dewlemendiyeke mezin e, parastin û pêşvebirina wî erk û stubatriyeke mirovayetî ye. Ji bo vê armanca pîroz, roja 21ê Sibata sala 2000î, UNESCO danezanek belav kiriye, têde roja 21ê Sibatê ji her salekê bi navê "**Roja Cîhanî Ya Zimanê Zikmakî**" destnîşan kirye.

Çima roja 21ê Sibatê hate bijartin?

Roja 21ê Sibata sala 1952an, beriya ku **Bengladiş** sala 1971ê ji **Pakistanê** veqete û azadiya xwe ya netewî bidestxîne, wê hingê, zimanê ARDO zimanê fermî yê dewletê li seranserî **Pakistanê** bû û zimanê Bengalî bindest û bê maf bû. Xwepêşandanek ji bo serbestkirin û fermîkirina zimanê Bengalî li DAKA yê ji bal xwendekar û rewşenbîrên Bengal ve çêbû, 5 xwendekarên Bengal di wê çalakiya pîroz de hatin kuştin. Rêzgirtin ji rewanê wan xwendekarên ku wê rojê jiyana xwe ji bo zimanê dayika xwe kirine qurban, ew roj hatiye bi navkirin. De vêca di bîranîna vê roja pîroz û bi nîşan de, ma gelo zimanê me yê Kurdî li Sûriyê di çi rewş û pergalê de ye?. Mixabin, ku karbidestên dewletê bi her hawî hewl didin zimanê me ji holê rakin û zimanê Erebî li şûna wî bi cih bikin. Xwendin û nivîsandina bi zimanê me yê zikmakî, weşandina kovar, rojname û pirtûkên pê têne nivîsandin li me qedexe kirine, çand û zargotina gelê me ya dewlemend berbend û kelemçe kirine, li şûna ku xebatkar û çalakvanên zimanê Kurdî xelat bikin, ew wan tewanbar û zindan dikin!!. **D.R(10)**